

KOMXEBATA

ZARAVÊN TEKNÎKÎ YA DUYEM

Ev ji salekî zêdetir e ku em li ser zaravên teknîkî dixebitin. Di gulana 2012 de me komxebata zaravên teknîkî ya yekem bi tevlibûneke dewlemend çêkir. Di encama vê xebatê de 358 peyv zelal bûn. Piştî komxebatê me van peyvên di Fasîkul 1 de çap kir û vê fasîkulê li sazî û kesan bela kir.

Wek ku min li jor jî got, em hê jî xebatan didomînin. Lê piştî komxebata yekem em hînî gelek tecrubeyên baş bûn. Di kurultaya TMMOB(Yekitiya Odeyên Endezyar û Avahîsazên Tirkiyeyê)ê de biryara avakirina lijneyekî derket û rêveberiya navenda TMMOBê jî vê peywîrê da İKK'ya Amedê. Piştî li Amedê hemû odeyên TMMOBê lijneyên xwe çêkirin û bi gihîştina wan jî lijneya navendî ya TMMOBê ava bû. Çend hevalên nû jî tevî xebatê bûn. Heft meh û nîv lijne li ser listeyek peyvên bi qasî 3660 peyv tê de bû xebitî. Di encama vê xebatê de 1352 peyv hatin erêkirin û pênaseya wan jî lê hat zêdekirin. Belê, êdî lijne pênaseya zaravan jî dinivîse. Bi nivîsandina pênaseyê berhema ku di encama vê xebatê de derkeve dê dewlemendtir be.

Van peyvên ku me di vê xebatê de erê kiribû me ji gellek kesên pîspor re şand da ku ew jî kontrol bikin heke şaşiyek hebe em rast bikin. Me berê carek van peyvên ji wan re şandibû, wan jî fikrê xwe nivîsibû. Piştî ku me peyvên erê kir û pênaseya wan nivîsî berî ku çap bibe em dîsa dişînin. Me ji zanîngeha Suleymaniyê, Enstîtuya Kurdî ya Stembolê, Kurdî-Der, Koma Vate û li gelek cihan wek Ewropa, Tirkiye, Îran û Iraqê ji kesên pîspor re şand.

Me pênaseya peyvên fasîkula yekem jî nivîsî û emê van peyvên jî di Fasîkul 2 de bi cî bikin. Di vir de em dixwazin ku dema Fasîkul 2 bikeve destê kesekî/ê karibe hemû peyvên bibîne. Em hêvî dikin ku dema me Fasîkul 3 derxist emê peyvên ku di Fasîkul 2 de ne jî lê zêde bikin.

Bu kurtasî em dikarin bêjin; emê xebatê bidomînin, van peyvên ku zelal dibin û di fasîkulan de çap dibin emê belav bikin, emê xebatê xwe herdem bi mantiqa zanistî bimeşînin, Fasîkula dawî emê wek pirtûk(Ferhenga Teknîkî) çap bikin û hemû zaravên zelal tê de bi cî bikin û bi jimarek mezin çap bikin.

Hasan GÜNEYLİ

KOMXEBATA
ZARAVÊN
TEKNÎKÎ